Perdên kesk û sor û zer bi ser de berdane.

Danhev û Lêkdan/ Mihemed Hemkoçer

Dûmahî : Dr.Ebdilmecît Şêxo : Rola Kovara (Hêviya Welêt) (1963-1965)Z. xelek:2

serokatiya paşayê Osmanî de şer bikin.
Gava ku dijî Kurdan cengek bû,dê Osmanî jî bi hemû hêzên xwe alîkariya Kurdan bikin.
Ev li hevhatin û dostaniya dê her hebe.
Lê gelek mixabin ku ev dostaniya bi serketina Osmanîyan û bi mirina Sultan Selîm re tev çû axa sar (guristan) û Turkan nerindî xiste navbera Began û ew berdan hev,ev dilpaqijiya me ji bo wan bûye dermanek û wan kanîbûn bi hêsanî hemû Kurdistan bikin bin destên xwe.

Siyaseta Turkan ev e;ku Kurdan bikin du beş, wan wek dîkan berdin hev û gelê Kurd ji hemû mafên netewî bêpar bihêlin.

Li dawiyê Hemreş Reşo hîn dibêje:Divê em xwe ji van nexweşiyan rizgar bikin û pêwwîst e em bi yekitiyê,wekheviyê bawer bin.

Herweha jî Soro di gotara xwe (Serpêhatiyên dîrokê) de balên xwendevanên xwe dikşîne ser hin xalên giring di dîrokê de û ew bi van

-
4-

wateyan wisa dinivîse:Gelek milet û netewên berî me di tevgera azadîxwaza xwe de pir welatparêz gornekirine,hêviya wan ew bû ku piştî derxistina zorkerên welatên xwe,gelên xwe bighînin azadiyê û dê welatên wan bibin buhuştek yan nîv buhuşt li ser rûyê zemîn,lê bi taybetî ev diyardeya di nav tevgerên miletên li paşvamayî, Asya,Afrîka û Emerîka latînî de xweş dide xûyanîkirin,lê em Kurd jî ji vê diyardeyê ne bêpar in,lê pir caran karbidestên wan welatan,welatên xwe ji miletên xwe re dikin zîndan û golek ji xwînê û karbidestên wan welatan soz û hêviyên têkoşerên azadiya welêt bi cih nayênin,ew dixwazin ku ew û çîna xwe bibin xwedanê xêr û bêrên dewlemendbûna welêt û milet careke din mîna berê dikeve ber paşvemayînê,di wê hîngê de hîn xebateke dijwartir li dijî kevneperst û nokerên Împiyalîstan têtе pêşiya gelê Kurd.

Herweha jî di gotara (Reya serbestiyê tenê di yekbûnê de ye) de bi ya me be,li vir komîta (Dengê Kurd) pêçîyên xwe pir baş û gelek di cih de daniy ser birîn û janên gelê Kurd û Kurdistanê û dibêje:Gelê Kurd li her çar beşên Kurdistanê xebateke dijwar ji bo mafên netewê bi rêve dibe,lewra jî ewa ji ber destên dijminan zordariyê,kuştin û lêdanê bi her awakî dibîne,lê piştî ku partiya Bes destlatdariya Îraqê kir,Kurd hêvîdar bûn ku ewa çareseriyeke dadmend û rewa ji bo mafên gelê Kurd bibîne û xwedmixtariyê ji gelê Kurd re di çarçewa dewleta Îraqê de biçespîne,lê karbidetên nûh jî dane ser şopên deslatdarên berê û şer li Kurdistanê hîn berdewam kirin,lê li Sûriyê jî,Besiyan rêya neyartiya Kurdan dane ber xwe û bi her endizyariyekê şerê wan dikin û ew dixwazin birek ji Kurdên Cezîrê ji ciyên wan derxînin û Erebên koçer li dewsa wan de bi cih û war bikin.Lê li Turkiyê jî Kurd bê mafên netewî mane û her kesê berevaniya mafên gelê Kurd dike,ew têtе kuştin yan ew di binî zîndanê de têtе rizandin,lewra jî divê Kurd bi yekdengî û bi yekdestî li dijî neyarên welatê xwe rawestin.

Lê di vir de dibe xwendevanek pirs bike,gelo çima di vê gotarê de ne bi erênî û ne jî bi neyînî li ser destlatdara Îranê,zordariya Şahinşahê xwînvexwar,rûxankerên (komara Kurdistanê) li Îranê tiştek ne hatiye nivîsîn !?.

Bersiv gelek bi zelalî ev e:Pêşengê gelê Kurdistana Başur,serokê şoreşa Kurdistanê têkoşer û nemir Mile Mistefa Barzanî li gor berjewendiyên

şoreşa Kurdistanê pêwendiyên xwe bi Şahê Îranê Mihemed Riza Behlewî re hebû û bi alîkariya wê deslatdarê têkoşîna şoreşgerî li Kurdistanê li dijî Ehmed Hesen Bekir û Sedam Hisên birêve dibir,lê piştî lihevhatina Sedam û Şahê Îranê di sala 1975 an de û helwesta Emerîka ya neyînî; şoreşa pêşengê gelê Kurdisanê nemir Mile Mistefa Barzanî têkçû.

Nemir û şoreşgerê Kurdistanî Osman Sebrî di kurtegotara xwe (Bawerî di warê xebata welêt) de balên xwendekaran dikşîne ser têgeha baweriyê;ew dibêje:Di warê xebata welêt de(Bawerî) çeka herî xurtir e û xebata bê bawerî tucarî naçe serî.Apo Osman Sebrî vê nêrîna xwe bi sê xalên jêrîn baş ronî dike.1-Divê em bi dadmendiya daxwaza xwe bawer bikin.2-Eger gelê Kurd ji xewê şiyar be,tiştek nikane xwe li ber xurtiya wê ragre.3-Divê em ji xwe bawer bikin ku em kanin gelê xwe bidin ser rêya rast.Di encamê de Osman Sebrî di vê baweriyê de ye,eger kîjan xale ji van xalên jorîn tune be,têkoşîna gelê Kurd seqet dibe û gel naghîne armancên xwe .

Wek me li jor destnîşan kiriye ku gelek helbestên nivîskarên gernas û rûmetbilind jî di vê hejmarê de hatine weşandin,Osman Sebrî bi boneya weşandina (kovara welêt) de helbestekê bi(14)malikan di bin navê (pîrozî) de belav dike,ew di vir de dibêje:Derxistina vê kovarê bi vî navî xweş ji bo xortên me yên li Ewropa lêhatineke gelek hêja ye,ew tekez dike ko ev kovara jî; dê ji bo welêt cirûskek geşdar be û zimanê me dewlemend bike:

(Kovara me ya nû îro (Hêviya Welêt) e

Dê wek royê ronak bike dinya me ya tarî

Zimanê me yê paşvemayî zar bike zengîn

Di vê reya han gelê me dê zûka şiyar be

Wê hîngê hezar xwelî li nav çavên neyar be.

…).

Lê bi boneya hatina cejna netewî (Newrozê) desteya vê kovarê helbesteke Osman Sebrî bi (44) malikan diyarî pêşkêşî xwendekarên xwe dike.Osman Sebrî di vir de xwe û xwendevanên xwe pir dilgeş dike û bi cejna Newrozê xwe serbilind dibîne û ew panorameke gîştî û ciwan

cejna Newrozê ji xwendevanên xwe re nîgar dike,gulên Buharî,tovên azadiyê di dil û hestên wan diçîne û bi stêrên çavên xwe wan jî av dide.

Dûmahîk heye

Dr.Ebdilmecît Şêxo : Rola Kovara (Hêviya Welêt) (1963-1965)Z. xelek: 2

Di hejmara duhem de em dikarin van gotarên kêrhatî û hin helbestên niştimanperwerî bi pênûsên cuda bixwînin:1-(Erke pîrozekanî Hêviya Welêt)Kamal Fuad.2-(Bi hatina cejna Newrozê) Desteya Kovarê.3-(Bîreweriya cejna Newrozê) ji (Dengê Kurd),hejmar (8) hatiye wergirtin.

4-(Newroz be xoş hatî,wê her bê rojî serxwebûn!!!) Şivan .5-(Perîşanî) Soro.6-(Nexweşiya me xweşiya neyaran e)Hemreş Reşo.7-)Serpêhatiyên dîrokî)Soro.8-(Reya serbestiyê tenê di yekbûnê de ye.)Dengê Kurd,hejmar (7).9-(Bawerî di warê xebata welêt de) Osman Sebrî.10- (ji rewşên şoreşa me) Şefo.11-(Li pê xelkê mayîn şermkarî ye)Gênco.

Lê di vê hejmara duhem de jî hin helbestên sudar û bi giyanê netewperstî bi pênûsên navdar li tevnê ketine:1-(Pîrozî),2-(Newroz),3-(Jan),4- (Gîsin),5- (Ker û azadî) yên Osman Sebrî ne.6-(Evîniya min) M. Bor.7-(Bilûrvan) Hemreş Reşo.8- (Hey qehremanê miletê Kurd),9-(Ta kengî emê karker û cotkarê Began bin)Cegerxwîn.

Herweha jî çîrokek tenê di bin navnîşana (diçim Hec) bi pênûsa Osman Sebrî hatiye nivîsîn .

Kemal Fuad wek endamê komîta rêvebirê (komela xwendekarên Kurd li Ewropa) di gotara xwe (Erke pîrozekanî Hêviya welêt) de weha dinivîse: Derçûna kovara (Hêviya Welêt) ne tenê ji bo xwendekarên Kurd li Ewropa bi kelk û sudar e,lê belê ewa ji bo Kurdên Turkiye û Sûriyê jî kêrhatî ye.

Herweha jî ew rewşên gelê Kurd li çar beşên Kurdistanê pir bi kurtasî di ber çavên xwendekarên xwe re derbas dike û zordariyên destlatdarên kevneperst û riçperest li ser gelê Kurdistanê dide xûyakirin.Lewra jî endamê rêvebir erkên kovara (Hêviya Welêt) di van çend xalên jêrîn de bi kurtasî dide xûyakirin:1-Erkî geyandinî dengî beşekanî Kurdistan be yektirî û be xwêndekaranî Kurd li Ewropa .2-Erkî geşepêdan û pêşxistinî ziman û edebî Kurdî û nîzîkirdinewey diyalêkte ciyawazkanî zimanekeman.

3-Erkî rûnkirdineweyî meseley niştîmanîman ke yekêke le amanca pîrozekanî komeley xoşewîsman.

Herweha jî li desteya kovarê re jî pêşniyar dike,ku ewa car caran bi zaravî Soranî jî berhemên xwe biweşîne taku Kurdên Kurdistanên Îranê û Îraqê jî kanibin wê kovarê bixwînin.

Lê bi hatina cejna Newrozê desteya rêvebira vê kovarê mijarekê di bin navnîşana (Bi hatina cejna Newrozê)arastî xwendevanên (Hêviya Welêt) dike û wan bi vê boneya dîrokî pîroz dike.Ewa bi kurtasî weha dibêje:Newroz di dîroka miletê me de bûyîneke mezin e,ewa tîne bîra me Kurdan ku çawa miletê me şoreş li dijî xwînmêjên xwe kir û ew ji ser textê keyatiyê (destlatdariyê) avêtin,herweha jî ew bi dengê bilind jî hawar dike û zordariyên hovane yên dewletênTurk,Faris û Ereb li ser her çar beşên Kurdistanê dicersîne,lê bi taybetî ewa şoreşa Kurdistana Başur pîroz dike, hovîtî û dirindeyên destlata Îraqê li dijî gelê Kurdistanê şerpeze dike.

Lê Şivan di bin navnîşana gotara xwe (Newroz be xoş hatî,wê her bê,rojî serxwebûn) de bi kurtebirî weha bi xwendevanên xwe re dibêje:Bêguman e ku bîranîna vê rojê qedereke xwe ya zor mezin û hêja di dilê her kurdekî de heye,bîranîna newrozê,bîranîna zehmetkêşiya miletê me ye û ji hêla din de;ewa nîşana çirandina zincîrên koledarî û serfirazîyê ye.

Şivan bi şoreşa Barzanî jî ya ku di sala 1961 ê de destpêkiriye pir serbilind e û ew hîn dibêje:Vê şoreşê dengê Kurd li nav hemû cîhanê belav kiriye.

Nivîskarê vê gotarê hîn bang li xwendekarên Kurd li Ewropa dike ku divê ew dengê miletê Kurd di nav cîhanê de berz bikin.

Xwendekarekî din di bin navê Soro de gotarekê di bin navnîşana (Perîşanî) de diweşîne,ew bi gîştî nêrînên xwe bi van wateyên jêrîn derdibirîne:Perîşanî maka (cihdera)nexweşiyê ye;ewê ji sedsalan de şaxên xwe di nav miletê me de berdaye,perîşaniya mirovan ne ji Xweda daye, miletê me jî ji vê nexwaşiyê jî ne bê par e,lê di rastiyê de miletê me dikane jîna xwe bughêre û di bin destên karbidestan

de nemîne.Lê Soro di vir de ne reşbîn e,ew bi geşbînî hîn dibêje:Lê niha miletê Kurd li tevayê Kurdistanê bi perîşaniya xwe hişyar bûye,ev jî di dîroka gelê me de bûyîneke mezin e,dijminên xwînmêj nema kanin mîna berê gelê Kurd bixopînin .

Sernivîserê Kovarê Hemreş Reşo gotareke dirêj di bin navnîşana (Nexweşiya me xweşiya neyaran e) de bi hurgil nêrînên xwe bi xwendevanên xwe dide nasîn û hişên wan bi agahiyên hişmendî perwerde dike û ew dibêje:Di pelên dîroka me de bang heye û dibêje:(Kurdino hûn kûr in,ez li vi rim),wek hûn dizanin piraniya birayên me ên ku di perçeyên **Kurdistanê din** de dijîn bi rêberiya (Partî Dêmokratî Kurdistan) xwe ji gelek nexweşiyên rizgarkirine û berve serxwebûnê de diçin,hêvî ev e ku Kurdistana Bakur jî rojekê pêşda bi xwe bihesin û van nexweşiyan ji xwe dûr bixin.Hemreş Reşo bi zelalî van nexwşiyan diyar dike û dinivîse:Nexweşiya me a mezin dilpaqijî,ezîtî,bê bawerî û oletî ye,ev nexwaşiyên jorîn bûne bobelat li ser serên me,em di dîroka kevin de herdem û ta niha hatine xapandin û yek ji van xapandinan ên giring di sala (1514) an de bû,heya wê salê (45) Beg di Kurdistanê aza de dijîyan û di wê demê de ceng di navbera Îraniyên Safewî û Turkên Osmanî hebû .

Sultan Selîm bi alîkariya Îdrîsê Betlîsî hemû Beglerên Kurdistanê anîn ser hev û bi wan re dostaniyek bi çar mercên jêrînî pêk anî.

Beg dê di welatê xwe de mîna berê azad bin.
Gava cengek dijî Osmaniyan bibe dê hemû Begên Kurd tev leşgerên xwe di bin

Rûpel 9

Dûmahî : Letîf Nêrweyî: Dîtinek li ser berxwedana Rojava

cudahî têkoşînên cûrbecûr bidin destpêkirin da ku gelê xwe ji qirkirinê biparêzin û hewl bidin ku yekîtiyek neteweyî biafirînin?
Bi dilniyayî , divê em kêmasiyan paşguh bixin û miletekî mezin ê bindest di berxwedanek pola de biparêzin, û piştî bidawîbûna şer bi awayekî objektîf û rexnegir binirxînin û kêmasiyan ronî bikin. Ji ber vê yekê, ji bilî berxwedanê, ji Kurdan re çareyek din tune bûye. Ji ber vê yekê, gelê Kurd li Rojava, wekî ku dibêjin (Şerê Man û Nemanê) dikin û dirûşmeya "jiyanek serbilind an mirinek serbilind" hatiye bilind **kirin.**
- Lêbelê, hejmareke piçûk ji nivîskar û dîndar ji dûr ve, an jî ya rast ji Başûrê Kurdistanê, HSD û berxwedana li Rojava rexne dikin û dibêjin: "Çima hêzên HSDê gihîştine Heleb û hin bajar û bajarokên din ên li **derveyî** sînorên erdnîgarî yên Rojavayê Kurdistanê?"
Divê ew rêzdar vê rastiyê di hişê xwe de bigirin ku dema şerekî xeternak li ser miletekî tê sepandin, cîhê rexneyê pir teng e û divê hemû takên wî miletî bibin yek, dest bi xebatekî hevbeş a siyasî û cemawerî û medyayî bikin da ku li kêleka têkoşîna çekdarî li ber xwe bidin da ku xetereyên vî şerî dûr bixin, eger tiştek hebe ku were gotin, dikarin piştî ku şer biqede kêmasî û bûyerên çêbûne werin nirxandin.
-Lê ewên rexnegir kîne? Piraniya kesên ku rexne dikin ew in ku ji ber dûrbûna xwe agahdariya têr li ser erdnîgariya siyasî, dîrokî û ewlehiyê ya herêma xwe nînin û fêm nakin ku berxwedana li Rojava ne tenê ji bo armancekê ye, lê ji bo çend armancên sereke ye:
Yekemîn: Berxwedana ji bo parastina axa Rojavayê Kurdistanê ye.
Duyemîn: Berxwedana ji bo parastina gelê Kurdistanê li Rojava û bajar û bajarokên ku hejmareke mezin ji Kurdan lê dijîn û çûyîna hêzên HSDê ber bi (Heleb û bajar û bajarokên din ên Sûriyeyê ve ji bo parastina bi sed hezaran Kurdan ji qirkirinê bûye bi taybetî di serdema êrîşên terorîstên DAIŞ û jinavbirina û nehêştina metirsiyên DAIŞê).
Sêyemîn: Berxwedan ji bo mafên destûrî û neteweyî yên gelê xwe û mafên civak û kêmneteweyên din ên li welêt û avakirina hikûmetek nû ya demokratîk.
Çaremîn: Berxwedan ji bo serkeftina ramana pirreng li ser nijadperestî û tarîkxwaziyê de.
Gihîştina van armancan ne karekî hêsan e û têkoşîna wê bê kêmasî û qurbanî nabe, lê rastiyek dîrokî heye ku "NA" ya Rojava ya ji teslîmbûnê bi deh mîlyonan "ERÊ" ji bo berxwedanê bi dûv xwe de anî.
- Her çiqas şerê ku li ser takekesên gelê Kurdistanê hate ferzkirin pir dilhejîn bûn jî, lê (NA) ya Rojava îspat kir ku neteweyek mezin li piştwan e û ew (Na) bû sedema jidayîkbûna nefretek pîroz di nav û dilê hemû welatiyên Kurdistanê û hêvana derketina xebateke hevbeş a siyasî, cemawerî , medyayî ya gelê Kurdistanê.
Ev têkoşîna hevbeş ne tenê piştgiriyek mezin a exlaqî ye ji bo Rojava, lê di heman demê de bala cîhanê û saziyên navneteweyî kişand ser zilma li ser gelê Kurdistanê heye û îspat kir ku her çend Kurd dost û piştgir neben jî. Belû dikare bi yekrêzî û siyaset pişt bi xwe girêdan û tekoşîna hevbeş rûbirûyê metirsî û alingariyan bibe.
- Ji aliyekî din ve, berxwedana Rojavayê Kurdistanê bû bingeha jidayikbûna xwepêşandanek girseyî ya berfireh li hemû beşên Kurdistanê û derveyî welêt ku bi salane gelê Kurdistanê xwepêşandanên xwerist ên berfireh û firereng bi vî awayî nedîtine û xwepêşandan li (50) welatên cîhanê tên kirin..
- Hêz û partiyên siyasî yên li Herêma Kurdistanê û beşên din ên Kurdistanê demek dirêj e li ser mijarên neteweyî bi vî rengî nehatine cem hev û helwestek hevpar nîşan nedane da ku peyamek fermî belav bikin, wek nimûne (10) hizb û aliyên serekî ên başûrê Kurdistanê di peyamekê de bi wêrekî û aşkira û berpirsyarane piştgîriya xwe ji bo Rojavayê Kurdistanê nîşandan.
Ev yekîtî û yekrêzî û helwesta siyasî, gelêrî û medyayî ya gelê Kurdistanê û şopandina siyasetek serbixwe bû sedem ku aliyên navneteweyî yên têkildar li xemsariya xwe binêrin û xetereyên berdewamiya şer çêtir fam bikin. Ji ber vê yekê, hewldanek heye ku li kêleka şerê ferzkirî dergehek ji bo danûstandinan, agirbestê û gîhandina alîkariyan ji bo penaberan were vekirin.

Kurdistanî Nwê

Letîf Nêrweyî: Dîtinek li ser berxwedana Rojava

Bi salan e, Rojavayê Kurdistanê bûye navûnîşana cîhanê û di salên bihurî de, ji ber berxwedan û mêrxasiyên xwe li dijî hêza terorîst a herî mezin, di hilberandina ezmûneke xweser û şêweyek rêveberiyê de, gelek dost û dijminên wê çêbûn, dostan gelek caran di rojên bi êş û azar de piştîvan bûn, her wisa jî neyarên wê li beramber hilkişana wê ezmûnê bêdeng nesekinîn, ji ber wê yekê di demê deh salên dawî de, gelê kurd li Rojavayê Kurdistanê rûbirûyê çasr şerên bi tirs a ku hatin sepandin bû.

Yekem: Şerê ku ji hêla terorîstên DAIŞê ve li ser gelê Kurdistanê li Rojava û deverên din ên Kurdî yên Sûriyeyê hatiye sepandin.

Duyem: Şerê ku ji hêla milîs û tundrewên ser bi opozîsyona Sûriyeyê ve li dijî gelê Kurd li wî welatî hatiye ferzkirin.

Sêyem: Şerê rejîma Esed a hilweşyayî ku li dijî gelê Kurd li Sûriyeyê ku hate ferzkirin.

Çarem: Şerê ku ji hêla artêşa Ehmed Şerih û bermahiyên DAIŞê ve li dijî Kurdên li Rojavayê Kurdistanê û deverên din ên Kurdî yên li wî welêt hatiye ferzkirin. Şerê vê care jî hindek cudahî hebûye digel hersê şerên din de ku bi awayê xalên cuda emê bixin berçavan:

- Di her sê şerên berê de, HSDê wekî tekane hêza li Rojavayê Kurdistanê, bi piştgiriya hêzên navneteweyî û çend hêzên welatparêz ji beşên din ên Kurdistanê, gelê xwe parast û rêveberiyek xweser ava kir ku hemû pêkhateyên li herêmê hembêz kir, lê niha, piştî şerê dawî yê hatî ferzkirin de, bêyî piştgiriya hêzên hevpeyman û bi piştbi xwe girêdan û piştgirêdan bi hêzên din ên siyasî yên li Kurdistanê, karwanê berxwedanê û xweragiriyê li dijî vî şerê dirêj berdewam dike.

-Cûdahiyek din jî ew e ku di şerên yekem, duyem û sêyem ên ferzkirî de, piştgîriya medyayî û cemawerê Kurdistanê ji bo Rojava ne di asta pêwîst de bû, ew tenê ji hêla çend aliyên kêm ve li Kurdistanê bi eşkereyî dihat dîtin. Lêbelê, di vî şerî de, medyaya Kurdî û gelê Kurdistanê bi giştî, li hundir û derveyî welêt, piştgiriyê didin Rojavayê Kurdistanê û yekdengî û yekdestî di romalan rengê xwe vedaye.

- Di her sê şerên din de, hozên Ereb hevxebat û hevçeperê hêzên şervanan bûn, lê di vî şerê ferzkirî de, ne tenê piraniya wan pişta xwe dan şervanên Kurd, belkû rayedarên Şamê, bi piştgiriya wan hozên Ereb, zengilê şer ji bo şerekî ferzkirî yê xeternak û karesatbar li dijî Kurdan lêda.

- Di şerên berê de, di navbera hêz û partiyên siyasî yên Kurdistanê ên li Rojava de nekû yekîtî tune bû, belkû hindek alî li Rojava rola opozisyona neyînî lîstin. Lê di vî şerî de, Kurdên Rojava bi îradeyek xurt û yekîtîyek neteweyî berxwedanê dikin.

- Bi heman awayî, li Başûrê Kurdistanê, hemî aliyên siyasî hevra nebûn ku piştgiriyê bidin Rojava ji hêla siyasî, cemawerî û di medyayê de. Lê belê di vî şerî de lihevkirin û îradeyek heye ku piştgiriyê bidin berxwedana Rojava ji bo kêmkirina xetereyên şerê ferzkirî. Lêbelê, hîn jî çend deng hene ku li ser rewşa li Rojava û berxwedana neteweyî xwedî nêrînên cûda ne. Piştî pêşkêşkirina hin pirsan, em ê bi kurtasî li dengên ku li ser rewşa li Sûriyeyê û şerê li dijî gelê Kurd ferzkirî xwedî nêrînên cûda ne binêrin.

- Li ser şerê sepandî, ev pirsyar derdikevin holê: Dema ku şerekî sepandî bi miletekî re rû bi rû ye, gelo derfetek an vebijarkek din heye an jî tenê vebijark berxwedan e?

-Gelo Di rewşek wusa metirsîdar de siyasetmedar, nivîskar, rewşenbîr û zanayên olî divê çi bikin?

- Gelo mimkun e ku em aliyê xwe rexne bikin û kêmasiyên xwe eşkere bikin di demekê de ku xetera windakirina axê û qirkirina miletekî di lûtkeya xwe de ye, an jî divê em bêyî **cudahî**

Rûpel 11

Xalid Elo hevalekî dilsoz û xebatkarekî dilêr bû

Dost û hevalên hêja
Bi babeta salvegera Heştem di ser koçkirina Birayê min û rêhevalê jiyana min Mamoste Xalid Elo re, ez vê kurte nivîsê diyarî hezkiriyên wî dikim..

Hevalê Xalid
Di gel bilbil dinalim
Di gel xortan dikalim
Di gel qîzan diqîrim
Bi şev û roj bi gav û dem
Bi teqîna topan re
Bi gurmîna bomban re
Tu jî bîr nabî hevalo
Di ber qêrîna jin û zarokên di jêr zemînan de
Di girtîgeh û zîndanên çeteyan de
Di kongir û civînên partîzanî de
Tu ji bîr nabî hevalê hêja
Li şêrewa , Deşta Cûmê , Cindirêsê , Bilbilê , Meydan Ekbezê , Çiyayê xastiya û Hawarê , li Şiyê , Çeqela , Mabeta û li navenda bajarê Efrînê di her kolanekê de bîranîneke me heye..
Li Bîrê Kosa , li Kitxê…. Rûniştina li ber dara gulê , xewa li bin dara gûzê , di ber vêxistina matorê re û amedekirina mize , ken û henekên te… Tu ji bîra min naçî delalo
Di amedehiyên Sersal û Newrozan de li ber solava Gemrûkê û Bendava Meydankê , li Yayla , zozan û seyrangehan li ber maseyê , bi awaz û şîngşînga piyalên meyê re her li ber çavên min naçe ji bîra min awirên wan çavên pilingî kenî hênik , bejnê zirav bihna şûşê dîzayr û dûmana cixareya di nav lêvên te de tu ji bîr nabî hevalo
Li Helebê , li Kobaniyê û Cizîrê , bîranînên me li mêvanxaneya (Asiya) û li Hola hevalê Cegerxwîn.
Li Kurdistana Başûr û Bakur li ber gola Wanê wêneyê hevalê Xalid herdem û her gav di bîra min de ye
Gelo ezê karibim bi tenê birînên Efrîna xwe bikewînim û derman bikim....
Kurte jiyana hevalê Xalid :
Di sala 1984an de li bajarê Efrînê hatiye jiyanê, zaroktiya xwe li gund derbas kiriye , xwendina xwe ya seretayî li gundê (Mistika) xwendiye , xwendina xwe ya amedeyî û navendî li bajarê Efrînê xwendiye.
Di sala 2005an de derbasî zanîngeha Helebê bûye û li wir zagonsazî xwendiye.
Di dawiya sala 1999an de û di destpêka sala 2000 î de ew weke hemû xortên me hestên welatparêziyê li cem gur dibin û guhdanê bi xebata netewî ya kurdî dike. Di vê çarçewê de wî guhdan bi dîroka tevgera gelê xwe kiriye. Dîroka şoreşên kurdî û dîroka Kurdistanê baş xwendiye û weke xortekî welatparêz peywendî û dostanî bi gelek aliyên tevgera xwe ya netewî re kiriye.
Di sala 2004an de ew derbasî nav xebata Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê bûye û di nav rêxistinên xwendekaran de xebitiye û di sala 2011an de ew bûye endamê komîta şaxê û di wê demê de Xalid û hevalê xwe Hişmend di Partiya Pêşverû de rêxstineke xwendekaran li Efrînê dadimezrînin û rêbertiya wê rêxistinê dikin. Wek xortekî parêzer û kadirekî partîzan li gelek çalakiyan li Efrînê beşdar bûye û gelek civîn û semîner ji xwendekaran re çêkirin e.
Di sala 2015 di konfiranseke herêmî de ew hate hilbijartin wek nûnerê şaxê ji kongireya Çardemîn re .
Di sala 2015an de ew endamê kongireya Çardemîn bû ya Partiya Pêşverû (Kongireya pakrewanên Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê). Piştî li darketina kongireya çardemîn di konfiransê Efrînê de bi piraniya dengan hevalan ew hilbijartin ji komîta herêmî re , û di wî konfiransî de ew bû endamê komîta herêmî û berpirsê rêxistina bajêr û wisa xebata xwe berdewam kir heya bi kêliya dawiyê ji jiyana xwe.
Ji bilî kar û çalakiyan û hevdîtinên rojane li nivîsgeha patiya me , her êvar ew li cem min bû , û bi taybetî di dema şerê Efrînê de.
Êvara 15 heyva Sibata 2018an de weke her roj ew ji bo mijareke partîzanî li cem min bû , me karê xwe bi dawî anî û me soz da ku siba di demjimê 10 bi sibê em hev bibînin , lê sed mixabin pistî sê demjimêran bi êş û xemgîniyeke mezin min nûçeya koçkirina wî bihîst.
Hevalê Xalid xortekî hêja û gernas bû , xebatkarekî paye bilind û cefakêş bû , hevalekî mêrxwaz û partîzanekî pêbend û dilêr bû , ew nimûneyeke zindiye ji xebatkarên partîzanî re. Mamoste Xalid yek ji wan xebatkarên dilsoz û bîrmend bû , û bi dirêjahiya salan ji buhara jiyana xwe di xebata netewî ya kurdî û di karê partîzanî de berdewam bû.
Bê westan di nav hemî beşên civakê de û di nav xwendekarên Zanîngeha Helebê de û di gelek qonaxên xebatê de hevalê Xalid bi mêranî dixebitî û wek xebatkarekî kulneder û parêzerekî zîrek bervanî

di ber rêbaza partiya xwe û doza netewî ya kurdî de dikir.
Hevalê Xald ji nifşê xwe re bav û bira bû , ji Partiya Pêşverû re hevalekî çalak bû. Nefsbiçûk bû bi heval û dostên xwe re , nefsbiçûk bû bi civaka xwe re , hêvî û daxwaza wî ew bû ku gelê kurd wek hemû gelên cîhanê bighê azadiya xwe û ala xwe li ser xaka xwe hilde û jîneke bi rûmet bijî.
Gelî camêran
Bi rastî çendî ku ez li ser vî camêrî bêjim û binivîsim ez kêm dibêjim ji ber ku em bi hevre mezin bûn. Em hevalê hevî jiyanê bûn û di hemû qûnaxên jiyana rojane de em bi hevre bûn û rojekê min kêmasiyek wî camêrî nedît. ji bilî ku ew hevalê jiyana min bû zêdetirî Yazde salan em bi hevre xebitîn û ez berpirsiyarê wî bûm û di hemû qûnaxên karê partîzanî de nayê bîra min rojekê min karek jê xwest û wî got ez ne vala me yan karekî min heye û hew… Lê belê ew herdem amede bû ji xebatê re û çi karê wî heba di cî de dihêşt û wisa digot : Mamosteyê min ez herdem amede me , kar û xebata me ya netewî di ser her tiştî re ye.
Bi rastî hevalekî xebatkar û dilsoz bû , hevalê hevalî xwe bû.
Çûna kak Xalid ne tenê zirara malbat , heval , dost û partiya wî bû , lê belê mezintirîn zirar bû ji civaka me re û ji tevgera netewî ya kurdî re.
Hevalê Xalid sond bi wan çavên te yên ku bi dehan stêran xwe lê digrtin : Bi navê te
Bi navê Kurd û Kurdistan û bi navê Partiya Pêşverû emê di rêveçûna xebata netewî ya kurdî û di karê partîzanî de berdewam bin da ku gelê me ji dagîrkeriyê rizgar dibe û dighê mafên xwe yên netewî di welatekî Azad û Demoqrat de.
Sed silav li giyanê te ey xebatkarê kulneder
Sed silav li giyanê te Ey dilsozê "Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê"
Heleb : 15 / 2 / 2026 Z - 2638 K

Heval û birayê te
Hişmend Ebdilmenan Şêxo

Parêznameya dîrokî ya Serok Mam Celal ji bo Kurdistanîbûna Kerkûkê

22 sal bi ser roja parêznameya dîrokî ya mezin a rewanşad Serok Mam Celal ya ku di civata desteya rêvebir ya Êraqê re pêşkêş kiribû derbas dibe, ku têda bi belge nexşe û dukumênetên dîrokî ya Kurdistanîbûna Kerkûkê ji bo hemû aliyan piştrast kiribû.

Tê bîra mirov ku 21 sal berê û di axaftina xwe ya dîrokî de dema civata desteya rêvebir roja sêşemê 9/2/2004`an dicive, rewanşad serok Mam Celal Talabanî, ku wê demê endamê desteya rêvebir a civata rêvebir bû, banga vegerandina Kurd û Tirkmenên ku ji hêla rêjîma Sedam Hisên ve ji bajarê Kerkûkê hatibûn dersînorkirin û her weha daxwaza referandûmê ji bo destnîşankirina nasnameya wê kir.

Her weha rewanşad Serok Mam Celal bi belge û nexşeyan dupat kir ku bajarê Kerkûkê beşek ji herêma Kurdistanê ye, lê wî tekez kir ku ew di vê dema niha de doza girêdana wê bi herêmê re nake, lê bi rengek ku biratiya di navbera pêkhatên wê de biparêze û dadê li dîrok û mafên rewa yên Kurdan dike.

Rewanşad Serok Mam Celal di wê rojê de û di wê civînê de tekez kir li ser pêdivîbûna mafên gelê Kurdistanê di yasaya rêvebiriya dewletî de ya ku civata niha gotûbêj dike, dest bi pêşkêşkirina rastiyên hebûna gel li ser navê gelê Kurdistanê li çar welatan hatî dabeş kirin, ango Tirkiyê, ,Êraq, Îran û Sûriye, û wî got ku gelê Kurd di sala 1925 de bi biryara Komela Miletan bi dewleta Êraqê ve hate girêdan.

Jêder : Kurdistanî Niwê - Malpera Xelat

Pîrozbahî bi boneya (35)'saliya Kurdistanî Nwê

Pîrozbahî bi boneya (35)'saliya damezrandina rojnameya (Kurdistanî Nwê)

Pîroz bahiyeke gerim arasteyî rêvebir û nivîskar û xwendevanên rojnameya (Kurdistanî Niwê) dikim bi boneya (35)'mîn salvegera derçûna wê bi zimanê kurdî, ku di (12.1.1992)'de, dest bi weşana xwe ya rojane kiriye û bi bê rawestan berdewam kiriye, û karîbû di seranserê van salan de bibe dengê miletê kurd û parêzerê doza wî ya rewa..
Di (20.4.2007)'de, çaxê ku ez hatim bajarê Silêmaniyê weke nûnerê partiya xwe (Partiya Demoqrata Pêşverû ya Kurdî li Sûriya), wê çaxê cara yekem bû ku çavê min bi vê rojameyê ket, û min hewil da bi berdewamî hijmarên wê bi dest xwe bixim ta roja îro, û ji ber zimanê wê yê xweş û şêrîn min bi riya wê xwe fêrî zaravê soranî jî kir, û vê paşiyê jî min karî bû bi şanazî bibim yek ji nivîskarê wê jî, lewma ez xwe yek ji malbata nivîskarên vê rojnameyê dibînim, û hêviya pêşveçûn û serkeftinê ji xebata wê re di xwazim.
Eger em bi wirdî temaşeyî hijmarên vê rojnameyê bikin emê bibînin ku gelek nivîskarên bi navûdeng têde beşdarbûne, û babetên gelek giring û buha li ser rûpelên wê nivîsîne û belav kirine, û birastî Kurdistanî Niwê wek yekem rojnameya kurdî ya rojane karîbû bibe jêderekî ciyê baweriya xwendevanên xwe, û bi rastgoyî nûçe û zaniyariyên dirust û hemereng bi berdewamî gihandiye nav destên wan, çi yên navxweyî û çi jî yên navçeyî û cîhanî û kurdistanî, her wiha vê rojnameyê karîbû bibe dengê miletê kurd li rojavayî Kurdistan di seranserî salên qeyrana sûriya de.
Ciyê şanaziya mine ku min jî karîbû di goşeyeke heftane de beşdarî nivîsandinê bibim di rojnameya (Kurdistanî Nwê)'de, di bin nav nîşana (Mam li Şam)'de, ku ew goşe zincîreyek gotar bû, ji (50) xelekî pêkhatibû, xelaka wê ya pêşî di (18.12.2022)'de, hatibû belavkirin, û xeleka (50), ya dawî jî di (14.1.2024)'de hatibû belavkirin, li ser jiyana Mam Celal li Şam û bandora wê li ser pêwendiyên wî bi cîhana erebî re..
Di dawî de jî ez dixwazim bibijim ku bi tenê yek kêmasiya vê rojnameyê heye, ew jî ewe ku tenê bi zaravê soranî tête belav kirin ku xwendevanên zaravê kurmancî jê bêpar dimînin, hêvî dikin di salên pêşde ev valahî jî were dagirtin..
Di vê boneya pîroz de, careke din ez rêvebir û hemî nivîskar û xwendevanên vê rojnameyê pîroz dikim û hêviya berdewamî û serkeftinê ji wan re di xwazim.

Silêmaniyê 13.1.2026
Elî Şemdîn
Endamê Mekteba Siyasî

Bi giyan û vîna Rojnameya Kurdistan Em xebata xwe dikin

Ji bo belgekirina binpêkirinên ku li Efrînê dibin û ji bo pêşxistina rojnamegeriya kurdî Desteya sernivîser a Rojnameya Pêşverû li benda gotar , belgekirin , hest û nerînên we ye.

Desteya sernivîser a Rojnameya Pêşverû

Pêşverû
Siyasî . Çandî . Gîştî

Rojnameya Pêşverû Dengê miletê kurd e
Dengê Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê ye

Pêşverû

Siyasî . Çandî . Gîştî

Rojnameyeke Mehaneye ji Aliyê Nivîsgeha Ragahandina Efrînê yaPartiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê Tê weşandin Hejmar (99) *Reşemî 2026 Z - 2638 K*

Dengê Pêşverû

Heşt sal di ser Dagîrkirina Herêma Efrînê re

Di roja 20 / 1 / 2018an de , Di demjimêr Sisê û sêzdeh xulekan de berî bi şeş salan balafirên cengî yên dagîrkerên Turk êrişî navenda bajarê Efrînê kirin , piştre her şeş navçe Bilbilê , Reco , şera , şiyê , Cindirêsê , Mabeta top-baran kirin. Herwiha hêzên dagîrkeriya Turk û nandozên artêşa nîştimanî ya Sûrî bi hemû çekên xwe yên giran bajarê Efrînê dagîrkirin di encamê de bi sedan pakrewan û bi deh hez-aran ji gelê me koçber bûn ji ber tpobarankirina bejayî û ezmanî bi ser herêmê de.

Piştî Heft salan ji dagîrkeriyê heya niha herêma Efrînê rastî tawan û binpêkirinan tê , çekdarên îslamî di dermafê welatiyên kurd de di kiryarên xwe yên ne mirovî de berdewamin ji talan , dizî , û destdirêjahiya li ser samanên wan , herwiha girtin , revandin û kuştinê li dijî wan bi kar tînin bi aramanca xizankirin û perîşan kirina welatiyên kurd da ku ew neçar bibin ku dest ji gund û bajarê xwe berdin û koçberiyeke firehtir di nav kurdan de were kirin û guherîna dîmixrafî li herêma Efrînê pêk bînin. Siyasetên ku dewleta Turkiyê dimeşîne ew siyaseteke pilankiriye ji bo tunekirina gelê kurd û berdewamiya pilanên wê ye ji dagîrkeriya xaka Sûrî re.

Em di Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê de vê bêtar û felaketê bi xemgîniyeke mezin di dermafê êş û azarên gelê xwe de bi bîrtînin , herwiha em wan cangoriyên ku di ber xak û rûmeta gelê xwe de canê xwe dane silav dikin û bi bîra xwe tînin , û van siyasetên Turk û Erebkirinê ya ku dewleta Turkiyê li herêmê dimeşîne em şermezar dikin.

Di heman demê de em bang li civaka nav-dewletî , deste û rêxistinên mafên mirovan dikin ku bi erk û berpirsyariya xwe rabin , û fişarê li ser Turkiyê bikin da ku dagîrkeriya xwe li herêmê bi dawî bîne , û peydakirina heyamek erênî û parastinek pêwîst ji bo vegera gelê kurd li Efrînê.

18 / 2 / 2026 Z - 2638 K

Desteya Sernivîser a Rojnameya Pêşverû

Sed silav li giyanê te ey dilsozê Pêşverû

Xalid Elo hevalekî dilsoz û xebatkarekî dilêr bû

Em dixwazin bi ewlehî vegerin Efrînê

Rojnameya Pêşverû

Pêşverû

Siyasî . Çandî . Gîştî

Ev Rojname Rojnameya we ye
Ev Deng û Hawara we ye
Zengîn bikin bi gotarên xwe
Ev xewn û Hêviya me ye
Hişmend

E.Mail: altekedome-efrin@hotmail.com Facebook التقدمي عفرين